H.d , hesta gişti li bal van hemerengên rêbaz û siyasetan ew bû ku em vêkre bê rewa ya zindankirînê ji bal desthilatekî Otoqratî ê bê bext ve riswa bikin , û hevbendîyek xûrt di nav me de hebû li hember çi tawankari yên derheqa çi berekî ji me di hate kirin .

2- Çi bîranînên we yên balkêş di zindanê de hene ku cihên xwe kûr di hiş û giyanê we de girtine û nayên ji bîrkirin?

Bûyerên balkêş ku ji bo hevalan re tên tûmar kirin ew helwestên mêrane ku pêk tanîn. Li destpêka girtinê em di sêlulên ku bi drêjayîa (180) s.m û firehî (90)s.m a bûn , bi dirêjaîya salek û sê mehan, ji bilî sê betaniyên kevn û qirêj li cem her yek ji me tune bû, heya meha çile ya diduwa me ji bilî çekên havînî tunebûn, rehmetiyê Kin'an û Deham û Xalid ên ku ji nava xwe digazinîn ketin astengiyên tendurustiyên sext de , Xwarina me : rojek savara tisî û mast bû û roja dî petatên kelandî û mast bû , tenê roja înê, birinc û tirşikek ku deh giram goştê bêlla tê de hebû, piştî du sal û heşt mehan em veguhestin zindan a Kelaê.

Li seretayî, mafê hepsî yên siyasî ên ku hepsiyên berî me jê sûd digirtin ji bo me jî pêk dihatin, lê piştî demekî, bêtir ji sed û pêncî peyamî gihîştin min ji bal rêxistinên cîhanî, Emnisty Internasîonal û komelên Mafên Mirov , rêcîmekî nû bi sextî li me û hepsiyên din hate aloz kirin, û tû mafên hepsiyên siyasî ne ji me re û ne ji yên berî me re berdewam kirin. Piştî salekê me veguhestin, her yek çû hepsa herêma xwe û di ancam de em çend heval hatin hepsa Hisîça ya nawendî û dîsan ew rêjîma Kelaê derbarê me de hate meşandin, ji bo hevdîtinên me û malbat û xizmanên me re , belgname ya Parastin ê pêwîst bû, û peyvê me bi malbata me re gereke bi zarê Erebî be, êdî min daxuyan kir ku ez êdî malbata xwe pêşwazî nakim an jî emê bi zarê Kurdî bipeyvin, Piştî şeş mehan rêveberê hepsê min agihdar kir kû hevdîtinên min û mirovên min azad e bi çi zarî be.

3- Piştî van guhertinên mezin di hemî warên jiyanê de li cîhanê, hûn paşeroja gelê kurd bi tevayî û ya gelê me yê kurd li Sûriyê, bi taybetî çawa dixwînin?

Guhertinên li cîhanê pêk hatine, pêwîste ku em wan sercem ne nerxînin bi yek şêweyî û ne bi yek radeyî. Îro roj Emerîka wekî serkirdeyekî cîhanê; bizav dike kû pêwendiyên wî û çalakiyên wî di her welatî û bi her rêjîmî re cuda bin ji wan çalakiyên ku, di welat û bi rêjîmên din re bi cih tîne, wek nimûne ; helwestên wan li hember Îraq û Lîbiya, û li hember Kûriya û Îran de.

Îro Emerîka piştgirê Kurdê Îraqê ye, ji sedema ku Kurdê Îraqê piştgirê wan bûn dema cenga azadkirina Iraqê ; Lê Emerîka ji bo berjewendiyên xwe, pêve dajot ku çend armancên Turka li Iraqê pêk bîne , lê ew helwêstên xurt ku miletê kurd pêk anîn, nemaze helwestên kak Mesûd ê Barzanî wergirt ne hiştin kû tu berjewendiyên Turka pêk bên. Li ser vê bingeha han pêwîste em istiratîgiya tevgera miletê kurd ava